

KITÊBA PÎROZ DI DERBARÊ ELAMETÊN MEHŞERÊ DE WISA DIBÊJE:

Vêya bizanibe ku, dê di rojên dawîn de demên dijwar çê bibin. Ji ber ku dê mirov, hezkirê xwe, zebûnê pera, pesnvedar, qurre, kufirbaz, ji dayik û bavan re bêîtaet, nankor, mindar, bê şewqat, lihevneker, îftiraker, binketê nefsa xwe, har, neyarê qenciyê, xayîn, bi inyard, ji xwe razî, ji Xwedê zêdetir ji kêfê hezkir, yên sûretê teqwayê nîşan bidin û hêza wî înkâr bikin bibin!

Wexta ku Îsa li ser Çiyayê Zeytûnê rûniştîbû, şagirtên wî bi tenê hatin cem wî û ji wî pirsîyan: Ji me re bêje, ma ew tiştana dê kengê bibin? Nîşana hatina te û dawîya vê dinê dê çi be?

Îsa bersiv da û ji wan re got: Hay ji xwe hebin, nebe ku kes we ji rê derxîne! Ji ber ku gellek dê bi navê min bên û bêjin: Mesîh ez im û dê gellekan ji rê derxînin! Hûn ê dengê şeran û gotinên şer bibihîzin, hay ji xwe hebin ku, hûn netirsîn; ji ber hewceye ku ev tişt bibin; lê belê hûn dawî nîne. Ji ber ku gel li hember gelan û qiraletî li hember qiraletîyan rabin, cîh cîhan dê birçîtî, weba û erdhejînan bibin. Lê hemûya van tiştan, destpêka jana ne.

Mexapin! Ne yên bêexlaqiyên cinsî dikin, ne senempe-restan, ne zînakiran, ne qûlamparan, ne homoseksuelan, ne dizekan, ne çavbirçîyan, ne serxweşan, ne kufirbazan, ne jî rêbiran dê Serweriya (ceneta) Xwedê bi mêrasî bigirin.

Xwendevanên delal:

Hela carekê ji kerema xwe re bifikirin, gelo di roja me de elametên ku li jor ve hatine rêzkirin kîjan kême? Ger ne kême be, wê gavê hatina mehşerê jî qet ne dûr e!

Hûn dikarin fikr û ramanên xwe ji vê navnîşanê re binivîsin:

Hêvî û Jîyan

Hoffnung und Leben e. V.

Postfach 10 13 82

33513 Bielefeld

Germany